

Agahdarî ji bo rêberên olî û civakê yên ku bersivê didin tundûtûjiya navxweyî û malbatî

Ma tu rêberekî olî yan civakî ku
di nav civata xwe de bersivê didî
tundûtûjiya navxweyî û malbatî?

Me rêbernameyek pêşvexistiye
ku ji we re bibe alîkar da ku hûn di
derheqê tundûtûjiya navxweyî û
malbatî de alîkarîyê daxwaz bikin.

Naverok

Ev rêbername agahiyan li ser van tiştan pêşkêş dîke:

- Bersiva kesên ku tecrûbeya tundûtûjiya navxweyî û malbatî dibînin 3
- Bersiva kesên tundiyê bi kar tînin 7
- Pêwindiyên alîkar 9
- Girtina notan 11
- Ma te zanibû? Hin rastiyên li ser tundiya navxweyî û malbatî hene 12
- Dayîna hişmendiyê di civaka xwe de 13

Ji bo bêtir agahdarî li ser mijarên taybetî têkildar e tundiya navxweyî û malbatî, ji kerema xwe serî li van malperran xîne:

- Derbarê tundiya navxweyî û malbatî

www.dcj.nsw.gov.au/children-and-families/family-domestic-and-sexual-violence/about-domestic-and-family-violence/what-is-domestic-and-family-violence.html

- Polîs, alîkariya qanûnî û qanûn

www.dcj.nsw.gov.au/children-and-families/family-domestic-and-sexual-violence/police--legal-help-and-the-law.html

- Raporkirina mecbûr

www.facs.nsw.gov.au/families/Protecting-kids/mandatory-reporters/how-to

- Çawa ewle bimînî

www.dcj.nsw.gov.au/children-and-families/family-domestic-and-sexual-violence/how-to-stay-safe.html

Li ser vê naverokê nerîna xwe bide?

Nerîn yan xemên xwe parve bike:

www.surveymonkey.com/r/ZJ8QK8L

Bersiva mirovên ku di tundiya navxweyî û malbatî de derbas dibin

Wekî civatekê yan rêberekî olî, dibe ku kesekî ku di tundûtûjiya navxweyî û malbatî de derbas dibe were cem we. Ev rêbernameya danûstendina mînakek e ku mirov çawa bi ewlehî bersivê bide kesê ku alîkariyê daxwaz dike. Naskirina tundiya navxweyî û malbatî her gav ne hêsan e, û dibe ku mirov rasterast ji we re nebêjin ku ew rastî tundiya navxweyî û malbatî dibin. Ji bo bêtir agahdarî derbarê tundiya navxweyî û malbatî biçe: www.dcj.nsw.gov.au/children-and-families/family-domestic-and-sexual-violence/about-domestic-and-family-violence/what-is-domestic-and-family-violence.html

Bersiva tundûtûjiya navxweyî û malbatî dikare dijwar be. Dema di gumanê de, van gavan bişopîn:

1. Bi hişmendiya vekirî guhdar bike
2. Fikarên wan rast bikin
3. Vebijêrkên piştgirî û referansê pêşkêş bikin

Rêbernameya danûstendinê, li ser rûpelên jêrîn nîşan didin ka mirov çawa van gavan di danûstendina bi kesê ku li alîkariyê digere bikar bîne.

Ger tu li ser tiştêkî nebawerî, ji kerema xwe telefone NSW Domestic Violence ji bo şîreta nehênî li ser 1800 656 463 bike.

Berî tu berdewam bikî, ji kerema xwe bi bîr bîne:

Heke tu şahidiya bûyereke tundûtûjiyê yan tu bawer dikî ku kesek di xetereyê de ye telefone polîs li ser 000 bike.

Tiştê ku wek xeterek dihêt hesabandin heke:

- Niha diqewime
- Tirseke yekser heye ku ew çêbibe
- Metirsiya jiyane ye.

Eger zarok têkildarin:

Ji bo rêberên olî mecbûrî ye ku raportkirina zarokan ji xeta alîkariyê ya parastina zarokan re ragihînin heke ew guman dikin, şahid in yan agahdar dibin ji destdirêjiya zarokan. Ger hûn agahdariyên bêtir derbarê destdirêjiya li zarokan dibe daxwaz dikin biçin vê malperrê:

www.facs.nsw.gov.au/families/Protecting-kids/mandatory-reporters/about

Rêberiya axaftinê



1. Bi hişmendiya vekirî guhdar bike



Ew: Ma we çend hûrdem hene ku hûn li ser tiştêkî biaxivin?



Tu: Belê bêguman. Tu baş î?



Ew: Ez ne bawer im ku ez bi rastî baş im. Min bi hevjinê xwe re hin pirsgrêk hene.



Tu: Mixabin ku ez dibihîzim, ma tu xwe rehet hest dikî ku tu hinekî din ji min re bêjî?



Ew: Bi rastî axaftin zor e. Her carê li min diqîre dema ku ez ji kar tîm mal yan dema ez ji serdana diya xwe vedigerim. Diya min di van demên dawî de ketibû xwarê û divê ez pirtir serdana mala wê bikim. Dema ku ez li wirim hevjinê min her dem telefon e min dike. Di van demên dawî de ew kilitên otombêlê ji min vedişêr e da ku ez nikaribim ji mal derkevim, û duh dema ez hatim mal ez gêr kirim.

Bike



- Piştrast bikin ku hûn rewşê bi tevahî fêm dikin
- Xemên wan cidî bigirin
- Piştrast bikin ku axaftina we ji hêla kesên din ve nayê bihîstin.

Meke



- Beryardana bilez
- Daxwaza delîlên tundiyê
- Ji wan daxwaz bikî ku bi destdirêjkerên xwe re sebûr bin.

2. Xemên wan rewa bikin



Tu: Ez kêfxweş im ku we ev yek bi min re parve kir. Ji kerema xwe bizanibe ku tu ne tenêyî, û awayê ku hevjinê te van tiştan dike nayê qebûl kirin.



Ew: Pir tirsnak e ku mirov di dawiyê de vê yekê bi kesekî re parve bike. Ji kerema xwe soz bide min ku tu ji wan re li ser vê yekê nebêjî. Ez ditirsim dê ew çawa bertek bike.



Tu: Bê guman, ez vê yekê bi tu kesî re parve nakim, ile ku tu yan zarokekî te di xetereya lezgîn de bin. Dû re ji min tê xwestin ku bi alîkariya guncav re têkiliyê deynim.

Bike



- Agahiyên wan veşartî bihêlin. Ger kesekî ji we xwest ku hûn tiştêkî veşartî bihêlin, dibe ku ji ber ku ew ditirsin ku tundiya xirabtir bibe yan ku mirovên din ê wan dadbar bikin. Lê, heke ew di xetereya lezgîn de bin, divê hûn bi polîs re li ser 000 têkiliyê deynin, û heke zarok hebin divê hûn cihê zarokan ji bo alîkariya parastina zarokan ragihînin 13 21 11.

Meke



- Pêşniyarkirina ku divê dev ji rewşa xwe ya xerabkar berdin. Ji bo mexdûrên-rizgarbûyî ne ewle ye ku bêyî piştgirî û alîkariya guncav derkevin. Ew herî zêde di bin metirsiya tundûtûjiya giran û mirinê de ne dema ku ew hewl bidin ku mal li cih bihêlin yan jî piştî ew ji têkiliya zewacê derdikevin.

3. Pêşkêşkirina vebijarkên piştgiriye



Ew: Gelekî spas. Ez nizanim ez niha çi bikim.



Tu: Ya rastî, ya ku min bihîstî ez bi xemim. Ez difikirim ku em divê şîreta profesyonel werbigerin, lê tenê heke hûn xwe rehet hest bikin. Xizmeteke bi navê New South Wales Domestic Violence Line tundiya Navxweyî heye û ew dikarin ji me re bibin alîkar ku em çi bikin. Em dikarin her dem telefone wan bikin.



Ew: Oh, ez hîn ji wê yekê ne bawer im, ez dikarim li ser bifikirim?



Tu: Helbet. Heke hûn biryarê bidin ku hûn pisporekî şewirmendiyê bibînin, em dikarin bi hev re telefon bikin. Ma tiştêkî din heye ku hûn dixwazin li ser biaxivin?



Ew: Ez bawerim ku ez niha baş im. Xweş e ku kes guhdarî bike.



Tu: Ma tu niha xwe ewle hest dikî ku biçî mal?



Ew: Erê, lê ger ez ne ewle bim ez ê te agahdar bikim.



Tu: Tu dikarî her dem bi min re biaxivî.

Bike



- Bihêlin ku ew zanibin heke ew alîkariyê red bikin ew dikarin vegerin
- Bîpîrsin ka riya herî baş û ewledar ya pêwendiyê bi wan re çi ye
- Ji wan re piştrast bikin ku alîkariya ji bo tundiya navxweyî û malbatî belaş e, ji ber ku gelemper e ku hin kes ji mesref bi xem bin
- Bînin bîra xwe ku hewcedariyên her kesî cûda ne, û dibe ku hin rewş ji yê din cûda bin
- Wan bi hêz bike ku bi xwe biryaran bidin

Meke



- Rûbirûbûna bi kesê ku tundûtûjiyê bikar tîne yan jî hewl dide ku di rewşeke tundûtûjiyê de destwerdanê bike, ji ber ku dibe ku zîrê bide we yan kesê tûşî tundûtûjiya navxweyî û malbatî bûye.
- Bi hev re pêşkêşkirin yan şîretkirina ji bo mexdûrên-rizgarbûyî û kesê tundiyê bikar tîne. Ev ji bo rewşên tundûtûjiya navxweyî û malbatî ne guncaw e û dibe ku metirsiyê li ser mexdûrên-rizgarbûyî û te bixwe zêde bike.

Normal e ku mirov tengahiyê bibîne dema ku li ser tundûtûjiya navxweyî û malbatî bibihîse. Ger pêdivî ji bo piştgiriye hebe û hûn dixwazin bi pisporekî re biaxivin, bi Lifeline re têkiliyê daynin 13 11 14.

Bersivdana kesên tundiye bi kar tînin



Dibe ku kesek ji we re bêje ku ew tundiye bi malbata xwe yan jî bi kesekî nêzîkî wan re bikar tîne.

Bînin bîra xwe ku hûn nemeçbûrin ku bersivê bidin wan heke ji we re nerihet e. Ger hûn nexwazin bi wan re têkildar bin, hûn dikarin hejmara **1300 766 491** ya **Xizmeta referansa Mêran** bidin wan.

Ger we biryar da bersivê bidin, ji kerema xwe di xalên jêr de bifikirin:

- Dema ku kesek tundiye bikar tîne her gav ne diyar e. Dibe ku ew ji we şîreta pêwendiyê bipirsin yan ji we re behsa nakokiya zewaca xwe bikin, ji ber vê yekê bi baldarî guh bidin her nîşanên hişyar yê tundiya navxwey û malbatî.
- Piştrast bikin ku di civînê de yê din hene, yan jî ew cîhek e ku hûn dikarin bi hêsanî jê derkevin heke hûn xwe ne ewle hest bikin.
- Ger ew bi daxwaz şîreta we ya berpirsiyariyê digirin, lê eşkere bikin ku bikaranîna tundiye qet nayê pejirandin.

Meke:

- Mafdarkirin yan biçûkkirina her reftareke xerabkar
- Şandîna wan ji bo dersên şewirmendiyê yan jî dersên birêvebirina hêrsê. Ev ji bo kesên ku bi malbatên xwe re tundiye bikar tînin negunca ne
- Nîqaşkirina bi wan re yan şermkirina wan, tev ku hûn hest dikin ku hûn ji wan hêrs bûne. Dibe ku ew bikaranîna tundiye zêde bike û wan ji lêgerîna alîkariyê dûr bixe
- Tiştê ku mexdûra-rizgarbûyî ji we re rapor kiriye behs bikin. Ev dibe ku ewlehiya wan tehdîd bike.

Ev rêberiya nîşan dide ku çawa bi kesê ku tundiyê bi kar tîne bidî û bistînê.

Tê pêşniyar kirin ku hûn:

- Pirsên vekirî bipirsin
- Hevsoziyê teşwîq bikin
- Teşwîqkirina berpirsiyariyê

Rêberiya axaftinê

Dibe ku ew bêjin:

“Wan ez pir hêrs kirim, ez teqiyam!”

Ji bo bersivdana bi pirsek e vekirî, tu dikarî bipirsî:

“Çi dibe dema hûn hers dibin?”

Bersîva wan:

“Ez dengê xwe bilind dikim. Hin caran tiştan davêjim yan dişkînim.”

Ji bo teşwîqkirina xweşiyê, hûn dikarin bêjin:

“Bi dîtina te endamên malbatê yê din çawa difikirin?”

Bersîva wan:

“Ez nizanim lê belkî ew ditirsin, lê hevîna min her gav min hêrs dike.”

Ji bo teşwîqkirina berpirsiyariyê, hûn dikarin bêjin:

“Spas ku we ji min re got. Ez bi xemim, û ez bawer dikim ku awayê te yê şaş e. Heke hûn amade bin, ez dikarim alîkarîya we bikim ku hûn xwe bigihînin piştgiriyê. Heke hûn amade ne, ez dikarim alîkarîya we ji bo wergirtina piştgiriyê bikim.”

Pêwindiyên alîkar: xetên alîkariya piştgiriya krîzan



Di rewşeke lezgîn de, telefon Sê Sifir (000) bike.

Ger kesek daxwaza şîreta we dike û hewce bi alîkariya lezgîn heye, ev xizmet 24 saetan berdest in, heftê 7 rojan.

Xeta Alîkariya Parastina Zarokan

132 111

Piştgirî ji bo zarokên di metirsiyê de

Link2Home

1800 152 152

Piştgiriya ji bo xanîdîtin yan stargehê.

1800 Respect

1800 737 732

Piştgiriya şewirmendiya neteweyî ji bo mexdûêan rizgarbûyî.

Xeta Tundûtûjiya Navxweyî ya NSW

1800 65 64 63

Şewirmendî û xizmetên piştevaniya şandinê ya wîlayetê ji bo mexdûrên rizgarbûyî.

Ji kerema xwe not bikin ku hûn dikarin bi gelemperî telefon xeta DV ji bo şîretê bikin, lê divê yê mexdûr ji bo wergirtina kaxezê li wir amade be.

Xizmeta Şandina Mêran.

1300 766 491

Piştgiriya ji bo mêrên ku tundiyê bikar tînin.

Xizmeta Wergerandinê (TIS)

131 450

Ji bo kesên ku hewce bi wergêr hene da piştgiriya peyda bikin, di nav de alîkariya ji bo xizmetên tundûtûjiya navxweyî û malbatî.

www.tisnational.gov.au

Pêwindiyên alîkar: xizmetên piştevanîyê ye din



Piraniya xizmetên piştevanîyê ji Duşemê heya Îniyê hene, û di navbera 9 sibehê û 5 êvarê kar dikin, lê dibe ku hin cûda bibin.

Gihîştina Qanûnî

1300 888 529

Alîkariya qanûnî ya gelemper.

Xizmetên Qanûnî yê Jinan li NSW

02 8745 6999

Piştgiriya qanûnî ji bo jinan.

www.wlsnsw.org.au/contact-us/

Alîkariya Qanûnî Yekîneya Tundiya Malbatî

1800 979 529

Piştgiriya qanûnî ji bo jinên ku di tundûtûjiya navxweyî û malbatî re derbas dibin

Xeta Gihîştina Xizmetên Mexdûran

1800 633 063

Şêwirmendî û piştgirîya demdirêj ji bo mexdûrên sûcên tund.

Xizmetên Karên Civakî yê Centrelink

136 150

Alîkariya aborî. *Daxwaza karmendên civakî bike.*

Şêwirmendiya Koçberan û Navenda Mafan

02 8234 0700

Piştgiriya ji bo kesên li ser vîzeyê.

Xeta alîkariya destdirêjiya ixtiyaran û seqetan ya NSW

1800 628 221

Piştgiriya ji bo ixtiyar yan kesên astengdar ku destdirêjiyê dibînin

Girtina notan



Ne hewce ye ku hûn agahdariya ji her eşkerekirinên ku hûn derbarê tundiya navxweyî û malbatî de digirin tomar bikin, lê gava ku hûn piştgirî bidin kesekî, girtina notan dikare bibe alîkar. Ger hûn biryarê bidin ku tomar bikin, ji birnekî:

- Ji bo vê yekê destûr ji kesê ku şîretê daxwaz dîke bikin
- Divê nenas bimîne. Tiştên wekî nav, temen, navnîşan, yan agahdariyên din yê ku dibe ku nasnameya kesekî eşkere bike veşartî bimînin
- Vê agahiyê bi ewlehî û taybet hilînin
- Di hin rewşan de hewceye ku hûn agahiyan bi rayedarên wek polîs re parvebikin.

Objektîv be


Tenê agahdariya ku ji te re hatî gotin tomar bike. Piştrast bike ku tu texmînan nakî yan dadbariyê li ser rewşa xelkê nakî.

Bo nimûne:

Binivîsîne: 'Ew hîn jî bi hevjin re tundûtûjîyê bi kar tîne, dibe ku zarok bikevin xeteriyê.'

Nenivîsîn: 'Ew bêberpirsiyar e û hîn jî bi hevjin re tundiye bikar tîne. Eşkereye ku ew berpirsiyartiya zarokên xwe nake.'

Girtina notan

Qeyda agahdariyê 

RO:
DEM:

Xemên ewlehiyê:

Min çi cure piştgirî da?

Ma ez li şîreta profesyonel geriyam? Encam çi bû?

Ma ez di sa hevdtinê bi wan re dikim?

Bi kurtî:

Koda QR ya li ser rûpela paşîn bişopîne da bigihêjî qalibê tomarkirina notê.

Ma te zanibû?



Hin rastiyên li ser tundûtûjiya navxweyî û malbatî.

Ferqa di navbera pevçûnên normal û tundûtûjiya navxweyî û malbatî de çi ne?

Hin nakokî di tækiliyan de normalin, lê destdirêjî qet ne baş e. Destdirêjî reftarek e ku zirara laşî, derûnî, yan devkî dide mirovan û carine ji bo bidestxistina hêz û kontrolkirina kesekî din tê bikar anîn. Ji bo zanîna cûreyên din yê destdirêjiyê biçe: www.dcj.nsw.gov.au/children-and-families/family-domestic-and-sexual-violence/about-domestic-and-family-violence/what-is-domestic-and-family-violence.html

Ma pêşxistina mafên jinan aramiya civakî tehdîd dike?

Mafên jinan mafê mirovan e. Pêşlêgirtina tundûtûjiya navxweyî û malbatî ya di civakê de wê civakê xurt dike. Lêkolînan nîşan da ku tundiya li ser jinê dê li cihên ku wekheviya jinan ji mêran kêmtir e, berdewam bike.

Ma baş e ku mirov tundiya bi endamên malbatê yan kesên nêzikî we re bikar bîne?

Na, tu cure tundiya qet nebaşin. Bi darê zorê li dijî îradeya kesan her cure tevger nayê pejirandin û li dijî qanûnê ye.

Ger kesek li ser tundiya navxweyî û malbatî yan destdirêjiya zayendî îdiayek e derewîn bike?

Daxuyaniyên derewîn yê tundiya navxweyî û malbatî yan destdirêjiya zayendî pir kêmtir in. Tundiya navxweyî û malbatê û destdirêjiya cinsî ji polîsan re kêmtir tê ragihandin. Bi gelemperî hin kes ji ber gelek sedeman nakin, di nav wan de tirs ku neyên bawer kirin.

Ma tundiya navxweyî û malbatî encama xwedîkirineke trawmatîk û tund e?

Bikaranîna tundiya hilbijartine. Gelek kes hene di zarokatiya xwe de rastî tundiya navxweyî û malbatî hatine û dema mezin dibin tundiya bikar naynin.

Ma ji bo mexdûr hêsan e ku dev ji tundûtûjiyê berde yan tækiliya hevjiyanê rawestîne eger bixwazibin?

Gelek sedem hene ku dibe kesek nikaribe tækiliyê ji destdirêjiyê berde. Gelek mexdûrên rizgarbûyî dixwazin ji mal derkevin, lê ew nikarin:

- Ew ji bo ewlehiya xwe yan zarokên xwe ditirsin
- Pereyên wan nînin ku debara xwe bikin
- Cihê ku lê bijîn nîne
- Ew wa bawer dikin ku ê kes ji wan bawer nake
- Ew şerm dikin
- Ew dixwazin ku malbat bi hev re bimîne.

Mexdûrên-rizgarbûyî dema hewl didin ji mal derkevin yan jî tenê piştî ji rewşeke tundiya derkevin, ew di bin metirsiya herî mezin ya tundiya û mirinê de ne.

Ma tundiya navxweyî û malbatî tenê di navbera cotên zewicî de çêdibe?

Na. Ew dikare bi endamên malbatê, kesên ku di heman malê de dijîn, zewicî û nezewicî û hevjinên berê de çêbibibe. Ew dikare bi her kesî re çêbibibe, xem nake ji çi çand, ol, zayend, zayendî, yan rewşa aborî be.

Ma kesê tundiya bikar tîne dikare rê li ber mexdûrê-rizgarbûyî bigire ku zarokê xwe nebîne ger bixwazibe dev ji tækiliyê berde?

Na, mafê zarokan heye ku bi herdu dêûbavan re pêwindî hebe, her çend e ku dêûbavên wan ji hev cuda bin. Lê, eger zarok di bin metirsiya tundiya de bin, wê demê mafê ditina zarokî dikare were guhertin. Her doz cûda ye, û şîreta dadrêsiyê divê ji parêzerekî/e ku di Qanûna Malbatê de tecrûbe heye were xwestin. Ji bo bêtir agahdarî di mijarên navxweyî û tundûtûjiya malbatî di Qanûna Malbatî de çawa tê ditin, û çawanîya rêkeftinê ji bo zarokan tîn destnîşankirin: www.familyviolencelaw.gov.au/family-law/arrangements-for-children/how-does-the-court-consider-domestic-and-family-violence/

Bilindkirina hişmendiya di civaka xwe de



Rêberên olî yan civatê, dikarin helwesta xwe ji bo bilindkirina hişmendiya tundûtûjîya navxweyî û malbatî bikar bînin. Bilindkirina hişmendiye beşekî girîng e ji bo pêşlêgirtinê.

Dibe ku hûn bixwazibin tiştekî wekî ku li vir tê raberkin yan jî vê agahiyê bikar bînin da ku çalakiya xwe ya danasîna planê bikin. Her weha hûn dikarin bifikirin ka hûn çawa dikarin di serkirdayetiya xwe ya rojane de di derheqê tundiya navxweyî û malbatî de hişyariyê bilind bikin.

Pêşveçûn bi riya we'zan yan ragihandinên civata giştî

Çima ev girîng e?

Axaftina li ser tundiya navxweyî û malbatî dikare dijwar be ji ber ku mijarek e hestiyar e. Lê ev peyama dikare bandoreke erênî li ser civakê bike.

Dibe ku ew rêber û endamên din yê civakê teşwîq bikin ku hişyariyê belav bikin. Her weha dibe ku kesî teşwîq bike ku li ser ezmûna xwe ya derbarê tundiya navxweyî û malbatî de biaxive.

Rêbernameyên ji bo danasîna peyama xwe

- Piştrast bike ku peyama te zelal e
- Hevokên wekî 'Tundî qet nayê pejirandin', yan 'Mexdûrên-rizgarbûyi' ji tundûtûjîya bi kar dihê ne berpîrs in'
- Li ser tiştê ku pêwindiyêke rêzdar, wekhev, û tendurust ku malbat biaxafe. Ji bo zanîna derbarê pêwindiyên tendurust: www.1800respect.org.au/healthy-relationships
- Nivîsarên pîroz, ayet û pratîkên ji baweriya xwe bikar bînin da ku pêwindiyên wekhev, rêzdar û malbatî pêşve bibin.




Piştrast bikin ku peyama we bi qasî dikare zelal be

Li ser medya civakî hişyariyê bilind bikin

Her weha hûn dikarin platformên medya civakî yên mîna Facebook, Twitter yan Instagram bikar bînin da ku hişyariyê belav bikin. Li vir çend peyamên nimûne hene ku hûn dikarin tevî posta xwe bikin:

- Malbatên ewledar wekhev û bi hurmet didin û distînin.
- Tundiya malbatî bi dawî bikin û zarokên xwe biparêzin.
- Nehîştina hevjiya xwe ji dîtina malbatê destdirêjiye.
- Ne baş e ku mirov kesekî rexne bike, ne bi henekî jî.
- Tundiya li dijî jin û zarokan bandorê li her kesî dike.
- Mafê her kesî heye ku ewle be. Mal û civakên xwe bikin cihekî ewle.
- Zarok dibînin, zarok dîkin - bandora xwe erênî bikin!
- Pêwendiyên baş bingeha bawerî û piştevaniya ji bo cudahiyên hev in.

Her weha dibe ku hûn bixwazibin pêwindiyên alîkar pêşvebibin.



Kengê divê hûn çalakiya xwe ya danasîne plan bikin?

Hin rojên ku ji bo şandina peyama we guncaw bin ev in:

- 8ê Adarê Roja Jinan e Cîhanî ye
- Roja Harmonî, 21ê Adarê
- Roja Tenduristiya Cîhanî, 7ê Nîsanê
- Roja Dayikê, Yekşema duyemîn her sal di Gulanê de
- Roja Navneteweyî ya Malbatan, 15ê Gulanê
- Roja Bav, Yekşema yekemîn her sal di Îlonê de
- Roja Aştiyê ya Navneteweyî, 21ê Îlonê
- Hefteya bê Tundûtûjî, hefteya sêyem her sal di Cotmehê de
- Roja Rîbana Spî, 25ê Mijdarê
- Roja Mafên Mirovan ya Navneteweyî, 10ê Kanûnê
- 16 roj Çalakiya Li Dijî Tundiya Zayendî, ji 25ê Mijdarê heta 10ê Kanûnê

Rojên din yê ku di civata we de girîng in, wek festîval û cejn ji dibe ku firsendên baş bin ji bo bilindkirina hişyariyê li ser tundiya navxweyî û malbatî.

Mînakên destpêşxerî, kampîn, û rêxistinên ku dikarin ji bo we bi kêrhatî bin:

- **Navenda Jinên Misilman ya Australya ji bo Mafên mirovan**
 - Malper: www.amwchr.org.au/
- **Li Dijî Tundiya Malbatî Bimeşin**
 - Facebook: www.facebook.com/WAFVAU/
- **Enstîtuya Baweriyê**
 - Malper: www.faihttrustinstitute.org/
- **Komîteya Illawarra Li Dijî Tundiya Navxweyî**
 - Malper: www.icadv.org.au/
- **Çavdêriya me (Our Watch)**
 - Malper: www.ourwatch.org.au/

Postera pêşvexistinê



Ev poster ji bo pêşvexistina xeta alikariyê ya 1800 Respect hatiye çêkirin. Hûn dikarin hûrguliyên pêwendiya rêxistina xwe di nav posterê de zêde bikin. Wekî din, hûn dikarin hevoksaziya jêrîn bikar bînin da ku ya xwe biafirînin.

Qalibê posterê

Di civaka me de
cihê tundûtûjiya
navxweyî û
malbatî nîne.

Hûn dikarin her dem ji bo
şewirmendiya belaş û profesyonel
telefone 1800 737 732 bikin.

Yan ji hûn dikarin bi kesekî ji
rêxistina me bi axivîn, û em dikarin
ji we re bibin alîkar ku piştgiriya we
divêt pêşkêş bikin.

**Ji kerema xwe pêwindiyê bi me e
girê bidin**

Di rewşeke lezgîn de, ji kerema
xwe telefone 000 bike.

Kodê QR yê li ser rûpela paşîn bişopînin da ku bigihêjin qalibê posterê.



Ji bo gihîştina van çavkaniyên serhêl, ji kerema xwe vê koda QR bişopîne.



Pêwindîgirêdana bi me re:

multiculturalengagement@justice.nsw.gov.au